



BORLÄNGE

Agahdarî ji ofîsa jîngehê ya Şaredariya Borlänge ji bo xwarinê ji bo covid-19

Ev agahdarî ji bo Şirketên ku kar û barê xwarinê dikin.

Vê ji bîr meke kû agahdarîyên nivîsî û şîretên giştî ji meqaman zû dikarin bîn guhertin. Tiştên rojane kû pêk tên her roj di pela <https://www.krisinformation.se/> û [borlange.se](https://www.borlange.se) <https://www.borlange.se> taqîb bik.

Bi kurtahî:

Qerara meqamê desthilatîya ji bo tendurustîya gel dibêji kû ji bo berî lêgirtina belavbûna covid-19, divê resturang, bar, û kafeterya, û her yê weke van li temamê Welat divê tedbîrên taybet pêk bînin kî, ji bo kû rê li belavbûna vê nexweşîyê bigirin. Di poçêkan de nêzîkbûna navbera mirovan, li cem maseyên xwarinê, cîhê bufeyan de anjî li ber baran gerek pêk neyê. Ew kesên kû servîsa xwarinê dikin, divê bi her awayî di nav karên xwede rê li belavbûna vê nexweşîyê bigirin.

Li jêr hinek sûal û bersîvên ji bo rêzîknameyên "meqamê desthilatîya ji bo tendurustîya gel, nivîsên wan û şîretên wan ji bo kû rê li belavbûna covid-19 bigirin, li resturanga û kafeterya û yê weke vana tu dikari bixwîni. "HSLF-FS 2020:9 <https://www.folkhalsomyndigheten.se/contentassets/419aae6d128c4f43ac87ea785ec9d7b3/hslf-fs-2020-9.pdf>

Sûal û bersîv

[Kîjan dikan dikevin nava van rêzîknameyan ?](#)

Restorang, bar, kafeterya, salonên dibistanan yê cîhê xwarinê, salonên cîhê xwarina personalan, karê îmalatê, klubên şevî, û dikanên din yê kû xwarin û vexwarinê difroşên muşterîyên xwe.

[Ji bo min ew kesê kû yek ji van karan diki ev tê çî wetayê?](#)

Ev tê vê wetayê kû, restorang, bar, kafeterya, salona xwarina dibistanan, klubên şev û weke van mecbûrin hinek guhertinan di kar û barên xwede pêk bînin. Divê ev dikan cîh nedin nêzîkbûna navbera mirovan ji ber kû belavbûna covid-19 zêdetir nebe.

Ev tê vê wetayê kû ji vir û pêde nabe kû mirov li ber cîhê barê têkevi dorê û xwarinê anjî vexwarinê sîparîş biki. Ger îmkan hebin û cîh ne teng bi, mirov dikari li ber dîskê sîparîşa xwe deyne û here xwarina xwe bîni. Xwarin û vexwarin jî divê herdem rûniştî bê pêk anîn.

Dikanên kû vî karî dikin, divê van rêzîknameya bimeşînin, û tedbîra kû mirov nêzîkî hev nebin bistînin. Yek ji tedbîran dikari kû mirov sistema numara bi karbîni. Mivan dikarin numara xwe bikşînin, û li dervî lokalê li bendeyî dora xwe bisekinin. Mirov dikari maseyan bi aweyakî deyne kû mudûrî hevbin. Yek din jî ji bo kû mirov nêzîkî hev rûnenê, mirov dikari li erdê hinek îşaretan boyax biki, ji bo kû mesafe hebi.

Kontorola bi xwe ji bo li dijî belavbûnê

Her kesê kû di nava civatê de dîvê agahdarbi kû bi her awayî rê li ber belavbûna covid-19 bigiri, û nehêlê belav bibi. Ev rêzîkên hanê ji bo ew kesên kû karê wisa dikin rêberî û mesûlîyetê şanî wan diki. Ji ber wê yekê divê mirov bi xwe kontorola xwe ji bo kû covid-19 belav nebe li ser nêzîkîyan muşterîyan hebe û nehêli kû zehmetîyên giran bi vî awayî di nava civatê de pêk bên.

Wê bi çi awayî mirov zanibi kû rêzîkname pêk tên?

Di qanûna parastênê de dinivîse kû her kesê di nava civatê de divê bi awayekî maqûl diqet biki, û tedbîran gerek ji bo rê lêgirtina belavbûna nexweşîyan pêk bîni. Armanc ewe kû mirov rîska belavbûna covid-19 kêmbiki, û nayê wateya kû gerek mirov restorang û kafeterya bigiri.

Doktorên parastina belavbûnê, dikari dikanên kû van rêzîkan pêk neynin bigirin?

Belê. Doktorên parastina belavbûna ji bo nexweşîyan bi hevkarên di Şarederiyêve dan û stendîne dikin, di navbera jînehe och parastina tendurustîyêde biryara bi hev re distînin. Ev doktoran bi şewirdarîya Şarederiyê ve dikarin ew dikanên kû rêzîkan nameşînin, bo wan dikanan qerara girtîne bikin.

Gerek nêzîkbûna navbera kesên kû tên zîyaretê çiqesî bi bo kû xetim bi?

Ji ber kû lokal û dikan hemû ne weke hevin, ev bersîvek zore kû mirov karibi bibêje. Bes mirov dikari teqrîben bibe kû mesafe kêmanî dive bi qeysî dirêjbûna çengekî bi.

Li restoranga gelo destûr heye kû mirov ji cîhê dîskê sîparîşa xwe biki û rûnê û li bendî servîsê bi, anjî divê sîparîş jî li ber masê gerek pêk bê?

Ger ev nebê sebaba teng bûnê (nêzîkbûna hev) mirov dikari sîparîşa xwe bidi, û dûvra here xwarina xwe bîni. Divê herdem xwarin û vexarin li kêlîka masê rûniştî bê pêk anîn.

Wekê berê bi rîya bufê, dikari mirov dîsa xwarina xwe bi xwe rahijîyê, û bê rûnê?

Belê. Ger mêvan bê kû nêzîkî hev bibin dikarin herne û rahijin xwarina xwe. Dema kû dor hebê divê bi qaysî dirêjbûna çengekî mesafe di navbera mirovande hebe.

Li kafeteryan, dikari yekî mêvan qehwa xwe sîparîş biki, û dûvra here li cîhekî (maseyekê) rûnê?

Belê. Bes nabe kû mêvan li cem dîskê li ser lingan sekinîbin û cîh li hev teng bikin.

Çê dibi kû mêvan li cem dîska barê rûnin û xwarina xwe bixwin?

Belê. Ger ev nebe sebaba nêzîkbûnê, û cîh li hev teng nebe, mêvan dikarin li wir rûnin, û xwarina xwe bixwin

Li dikanên kolanan (Gatukök) de dikari mirov di pencerê ve servîsê bigiri?

Belê. Heta kû tengbûna nêzîkî ya mirovan nebe, mirov dikari wisa biki.

Ev qaîden li hundir û li derve wê weke hevbin?

Belê. Ew qaîdeyan li hundir û derve wê wekî hevbin.

Çê dibi kû mirov li restorangên kû xwarina zû çê dikin têkevin dorê?

Belê. Bes nabe kû mirov nêzîkî hevbi. Mêvan divê mesafeyekê têxin navbera xwe.

Wê anha jî klubên şev vekirîbin?

Belê. Bes ew kesên kû kar û barên klubên bi şev di meşînin, dive mesafeya navbera mêvanan kêmasî bi qeysî dirêjbûna çengekî pêk ve bînin.